# Veger

**Silêman Demir**

Min herî dawî, pirtûka dostê hêja Şahînê Bekirê Soreklî ya bi navê Veger xwend. Pirtûk, romaneke ku sala 2006an li Dihokê ji alî Yekîtiya Nivîskaran ve hatiye çapkirin e.

Min berê jî pirtûkên birayê Şahîn xwendibûn û min ew wek nivîskar li ba dost û nasan pesinandibû. A ku min di nivîskariya Şahîn de herî balkêş dîtiye, rastgoyî û dilsoziya wî ye û ku xwe ji bo xatir û rexneyan sansur nake. Ew di warê siyasî, îdeolojî û felsefî de, gotina xwe, heger her demê ne heşkere jî be, her dibêje. Ji ber vê yekê, ew dike ku baweriya xwendevanên wî bi rastiya gotina wî bê.

Mijara pirtûka wî ya vê carê, ne çîrokeke wek hemû çîrokên ku di jiyana rojane de dibin ya jî dikarin bibin e, lê bi carekê re fîktîv e, ango çîrokeke xeyalî ye, xewneke mezin e. Şahîn, hemû di xeyalên xwe de afirandiye û wek kirasekî rangîn li jiyanê û civata kurdan kiriye. Pirtûk bi vê hela xwe xwediya taybetiyeke xweser e.

Çîroka pirtûkê, ji serî heta dawî xewn, bêrîkirin, hisret û hêviyên bi rûmet in. Di ber û pişti hemû zahmetî û tahlûkeyan, jîyana çîrokê geştir dibe û hin ji hêviyan rast derdikevin. Lê heger wext derfet bida çîrokê tevî, ew ê hemû rast derbiketa. Bûyer hêdî hêdî dest pê dikin, bi dû re germ dibin û herî dawî jî nerm dibin û xweş dibin. Ev proje, ji bo çîrok û pirtûkekê ya herî baş e. Û her wilo, çîrok ji hêla kronolojîk ve jî rast di hev derdikeve.

Gava mirov dest bi xwendina pirtûka Şahîn dike, hîna berî ku mirov ji ravekirinên serî yên bê bûyer ku di piraniya pirtûkan de hene aciz bibe, bûyer dest pê dikin û mirov bêhêvî nake. Mirov bi destpêkirina bûyeran re hema dikeve mereqa bê wê çîrok çawa bibe. Şahîn, wilo, çîrokeke ku mirov ji serî ve nikare tê derbixe bê dawî çawa ye, ava kiriye. Û ji xwe wî çaxî jî-heger ez ji bo xwe bibêjim- mirov tê derdixe û bawer im ku wê piraniya xwendevanan tê derbixin ku Şahîn ked û demeke mezin daye afirandina çîrok û pirtûka xwe, rûmet daye

xwendevanên xwe û serê xwe bi çîrokê û pirtûkê re êşandiye.

Her wilo, ji wî çaxî pê ve, êdî mirov hêz û zaniyariya bêjer ya xeyalkirin û li hev hûnandinê û ya di derbarê civata kurdan de dibîne. Bi vî awayî bêjer, ango Şahîn, rolgirê herî mezin e û hemû tişt di kontrola wî de ne.

Çîroka pirtûka Şahîn, çîrokeke kollektîv e. Wî, rolgirên mezin, ên super neafirandine, ew mirovên ji rêzê, bi gotina binxetiyan, adî ne. Şahîn, kar, bar û rolên pirtûkê li gelekan dabeş kirine. Û her yek ji wan di hed û rêza xwe de, xwe li kar û rola xwe radigirin.

Heta berî ku pirtûk nêzîkayê li dawiyê bike, mirov bes tenê zilaman di çîrokê de dibîne (bêyî jina melle Boyar). Ez bi xwe ketim tirs û şika ku ma gelo Şahîn xeletiyeke mezin kiriye û civateke bes tenê ji zilaman pêkhatî ava kiriye. Lê na, wî, gava hewce bû û çîrok bû çîroka civateke sîvîl, pîrek jî derxistin û rol da wan jî. Her wilo, wî xwestiye êş û zahmetiyên jinan ên taybet jî heşkere bike û rûmet daye wan.

Gava Şahîn rol daye rolgirên pirtûka xwe, wek hêla wê ya fîktîv, di hin der û kesan de taybetiya dubbel rol, dubel kes jî daye pirtûkê. Bêjerê çîrokê geh bi forma EZ e û geh jî bi forma author e. Ango geh bêjer bi forma EZ xwedî rol e û çîroka ku ew bi xwe di nav de ye ji me re dibêje û geh jî wek vebêjer pasîv e, ji jor ve li bûyeran dinere, hemû tiştan dibîne û ji me re dibêje.

Bêguman mirov dikare hin gazinan ji zimanê pirtûkê yê hinekî lokal, ango herêmî bike, lê ji hêleke din ve gazineke wilo dikare ne bi heq jî be. Ew gazin, ne ji Şahîn bi xwe ne, lê ji dûrîhevketina civata me ne. Tevî van zahmetiyan jî, bi qasî ku Şahîn ev zêdî 35 salan e li derveyî welêt e, wek ku nû ji welêt çûbe, rastiya kurdan ya civatî û ya di nav jin û mêran de dizane û wek stûneke pirtûkê ya bingehîn, xweş hûnaye.

Ez hêvîdar im ku wê birayê Şahîn hîna gelek berhemên din ji me re binivîse û pirtûkxana me dewlemendtir bike. Ez ji ba xwe, ji bo pirtûkên ku heta niha ji me re nivîsîne spas dikim û ez ê li bendî ên din bim.